28 ve 29 Mart 1987 Pazar

"TKP'nin Sesi"

Bu yayınımızda şunları dinliyeceksiniz:

1. NEREDE BİR YOLDAŞ VARSA TKP ORADADIR PROGRAMINDA:

- "Yeni Çağ" dergisinde yayınlanan TKP MK Politik Büro üyesi Ali Alptekin'in: "İllegalitenin Engellerini Aşarak" başlıklı yazıyı Spk: Den. ve Nec.

- Kürtçe yayınımızı (Haz. Ahm.) Spk: Ahm.

---

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TUSTAV

(Kadro) 28.3.87

Komünist ve işçi partilerinin aylık teori ve enformasyon dergisi Yeni Çağ-Barış ve Sosyalizm sorunları dergisinin Mart xxxxdx sayısında, TKP MK Politik Büro üyesi Ali Alptekin'in "illegalitenin engellerini aşarak" başlıklı bir yazısı yayınlandı. Şimdi size bu yazıyı sunuyoruz:

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

29.3.1987

TKP'nin Sesi

Ahmet

Kürtçe:

Konu: Sol birlik zirve bil. Mahabad Kürt cum.

Müzik: 390 - 3.6 dk.

6.4

Xwişk û bırayên delal, hevcıvina hêsi ya 1987'an ya Yekıtiya Çep çêbû. Jı 6 partiyên ku Yekıtiya Çep damezırandıne rêbırên seviya bılınd tevi hevcıvina hêsi bûn. Hevcıvina hêsi xebatên sala derbasbûyi dı bın çawan da derbaskır, jı bona ku kêmasiyên xebatên berê werın derbaskırın û xebatên ku icabdıkın dı dema pêşiya me da werın bırêkırın rêzek bıryar gırt.

Hevcıvina hêsi ya Yekıtiya Çep geşbûnên dınê, hêramê, Tırkiyê û geşbûnên Kurdıstana Tırkiyê gırt desta. Bal kışand ku dı nav van geşbûnan da berpırsiyariya hemû hêzên aşiti û demokrasiyê zêdebûye.

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Guhdarên delal,dı dawiya hevcıvina hêsi ya Yekıtiya Çep da belavoka encam hat veşandın.Dı belavokê da berê pêşin lı ser rewşa dınê tê sekınandın.Nişan dıbe ku iro dıjmınê ewılin yê mırovati û aşitiyê Rêbırına Reegan a ku nûnertiyê dıke Qompleksa senayi a leşkeri û serokên Natoyê ne.~~Partiyên Yekıtiya çep~~ programa ku Yekıtiya Sovyetan dı 15 Berfbarinapaşin 1986'an da eşkerekır û lı hemû dınê pıştekek fıre qezençkır Heta sala 2000'an rûyêerdê jı çekên atom were paqışkırın (Partiyên Yekıtiya Çep) ~~em~~ pıştekdıkın.Neytranên han mafên gelên Tırk û Kurd dıteyısinin.

Dı belavoka Yekıtiya Çep da lı ser rewşa hêrama me ji tê sekınanıdın.Kıfşdıbe ku "ajotına şerê İran-Iraqê,pırsiyarên gelên Filistin, Lubnan û gelê Kurd yê negihiştine hurındarê,dı pırsiyarên Qıbrıs û Egeyê da berdevambûna ışkbûnê,lı hêrama me bı tehereki esse aşitiyê gaf dıke.Jı vê sedemê lı Rojhılatanavin,lı Rojhılata BahraQerqaş û û Balqanan

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV

politika kışkırnê ya emperyalizma Ameriqayê xeteriyên esse dıafırine. Dı belavoka Yekıtiya Çep da nişandıbe ~~kx~~jı bo pındamkırına xeteriyên han ~~hemû pêşverû, hêzên şoreşgerên hêrama me~~ mecburiyete ka hemû pêşverû û ~~ş~~ hêzên şoreşgerên hêrama me tevgerek bıhevra pêkbinın.

~~Ex~~Guhdarên delal, dı belavoka Yekıtiya Çep da lı ser rewşa Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê geleki dûr û dırêj tê sekınandın. Kıfşdıbe ku dı qaraqterê rejima faşist da guherandıneké ~~babete gotınê nı~~ naye qıssekırın ne. Zordesti û zorkariya diktatoriyê berê pêşin lı ser hêzên çep, lı ser karker û xebatkaran, lı ser gelê Tırk û Kurd dıdome. Gırtın, pırskırınên polês û êşkence dajon. Dı gırtigehan da hê ji gelek hejmar gırtiyên politik hene.

~~X~~Xwişk û bırayên delal, guhdarên hêja, dı belavoka Yekıtiya Çep da

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

nişandıbe ku lı Tırkiyê buxrana abori bı kûrbûnê dıdome.Enflasyon jı nuhve hıldıkışê jor.Deynên derwayi cara ewılıne ku 30 milyar dolar derbaskır.Dı nav gel da xızani,nexweşiyên zû beladıbın,bıxwe xwe kuştın,û sosretên çepel dıgıhêjın rewşek ku tev nehatiye ditın.

Lı Kurdıstana Tırkiyê terora dewletê bı hemû lezê tê ajotın. Zordesti,teror û rêbırınaleşkeri hebûna xwe dıdomine.Gundên Kurd bı darê zorê û bı maneyên sexte tên valakırın.Rejima diktatoriyê dı vê dawiyê da ji berbi gelê Kurd planek pır fıre û belavbûyi ya ajotınê xıstiye rê.Bı viya armanc dıbe ku gelê Kurd bı darê zorê were helandın,tekoşina demokratik ya netewi ya gelê Kurd bıde telandın.helandın)

Bı kurti iro lı Tırkiyê demokrasi tuneye.

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Heqên merov yê heri bıngeh dı bınê lıngan da tên gırtın.Em partiyên Yekıtiya Çep gazidıkın ku hêzên pêşverûyên dınê alikariya xwe ya jı bo aşiti,demokrasi û heqên mrov bı tehereki bıbıryari hin bılındbıkın.

Belavoka Yekıtiya Çep wusa dıdome:"Bı tevi ku dı nitelıka rejimê da guherandınek tuneye,diktatori her ki dıçe jardıbe.Ancax ew nayê mana han ku diktatoriyê bıxwe û hêsani were hırşandın.Çepê viya,icab dıke ku lı dıji diktatoriyê hêzên çep,komên karker û xebatkaran,gelên Tırk û Kurd tekoşinek dıjvar bırêbıkın.Ger neyê pındamkırın hılbıjartın gıştî ya dema pêşiya me jı vi aliyi da gıringiyek mezın dıkşine.Jı bo yekıti û bıbıryari ya hêzên demokrasiyê,jı bo bılındkırına tekoşina komi ya bılibat,jı bo hırşandına hukumata Ozal,jı bo ku mıdexeleya

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

ordiyê jı jiyina politik were pındamkırın,û jı bo ku pındamên lı pêşiya demokrasiyê ne werın derbaskırın dema han mecbûriyet e. Xwişk û bırayên delal,guhdarên hêja,belavoka Yekıtiya Çep hê dawiyê ji lı ser greva karkerên Netaşê û lı ser lıvinên xortên xwendevan dısekıne,nişan dıke ku lı hemberê hemû zordestiyan ji dı tekoşina koman da jindariyek ku bı çawan tê ditın heye.Belavoka Yekıtiya Çep wusa dıqede:"Geşbûnên dınê,hêrama me,geşbûnên Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê berpırsiyariya hemû hêzên aliyê aşiti û demokrasiyê hin ji zêdedıke.Yekıtiya Çep bı vê zaniyariya berpırsiyari bıbıryare ku, heta jı dest were vezifên ku dıkevın ser vê bı tehereki hin ji bıhêz bine ci.Yekıtiya Çep ê,komelbûn û pıştekarê gavên ber bi aşiti,demokrasi û pêşveçûyina civaki bıbe.Yekıtiya Çep jı bo armancên han

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

jı bo vekırına rêya rızgariya netewi û civaki ya gelên Tırk û Kurd, bı hêzên ku armancên han parvedıkın ra jı diyalog û geşkırına hevkariyê ra amade ye.Yekıtiya Çep,lı berê pêşin bı hêzên çep ra jı bo yekıtiya hêzên demokrasiyê were peydakırın vê hemû qiretên ku jı dest werın rayêbıde."

Müzik:

Guhdarên delal,roja 11 Adarê lı ser gaziya gruba Komunıst Jı Partiya Komunıst ya Tırkiyê,jı Partiya Komunıst ya Iraq,jı Partiya Demokrata Kurdıstana-Iraq,jı Partiya Tudeh a İran û jı Komela Fedayi yên Gel yê İran lı parlamentoya Avrupayê hatın cem hev û hevcıvinek veşem sazkırın.

Jı bo şerê dı navbera İran-Iraqê gavekê pêşda were dawikırın gruba komunıst ya Parlamentoya Avrupayê gaziyek navbernetewi kırıbû.Jı bo pıştekkırına gaziya navbernetewi neminentê 5 partiyên

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

han hatın cem hev. Hemû neminentê partiyan dı axaftınên xwe da encamên şerê navbera İran-Iraqê lı pêş çawan raxıstın. Dı ajotına şer da rolê ku Ameriqa dıleyize nişankırın û daxwezkırın ku destra şerê İran-Iraqê were sekınandın. Neminentên partiyên han weki dın ji ~~daxwezkırın~~ xwestın ku lı hêramê jı heqê qedera xwe bıxwe tayinkırına gelê Kurd ra gırami were rayêdayin.

Neminentê PKT'yê dı axaftına xwe da ani zıman ku Ameriqa û hevkarên vi yên Anqerayê dest dı destê hev da jı aliyê ku yekıtiyên leşkeri yê Tırk têkevın Iraqê planan çêdıkın. Neminentê PKT'yê gazikır, ku jı bo ku yekıtiyên leşkeri jı Kurdıstana Tırkiyê şûnda werın kışandın, jı bo ku jı heqê qedera xwe bıxwe tayinkırına gelê Kurd ra gırami were rayêdayin û jı bo ku gafên ber bi welatên

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

ciranan werın dawikırın parlamentoya Avrupayê lı ser hukumata Tırkiyê zordestiyê bıke.

Disa dı eyhi rojê da gelek xebatkarên Kurd û Tırk ~~protestoyek~~ jı bo ku ~~xxxxxxxxxxx~~ yekıtiyên gırêdayi qewetên bıçek yên Tırk jı Kurdıstana Tırkiyê şûnda werın kışandın û operasyonên Kurdıstana Tırkiyê werın dawikırın lı ber parlamentoya Avrupayê protestoyek sazkırın.

Müzik: 311 [illegible] - [illegible] 2dk.

31'ê Adarê roja şehidên Kurdıstanê ye

Xwişk û bırayên delal,guhdarên hêja,jı vır çıl sal berê dı tarixa 31 Adar 1947'an da serokkomarê Komara Kurd ya Mahabadê Qadi Mıhemmed û hevalên vi lı bajarê Mahabadê,lı meydana Çuwarçırayê hatın dardakırın jı vê rojê vırda gelê Kurd tu car ew lawên xweyê mêrxas jıbirnekırın

[illegible] şehidên Kurdıstanê

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Qadi Mıhemmed dı sala 1901'ê da lı bajarê Mahabadê hat dınê.Hinbûna oli dit,bû seyda.Qadi,weki ku gelek mele û seyda dıkın,jiyina xwe dı mızgeft û ocaxan da derbasnekır.Jı bo tekoşina gelê xwe ~~kx~~ bê vestandın xebatkır.Rewşa ku gelê Kurd dı nav da bû baş naskır. Jı bo guherandına vê rewşa xırab qiret xerckır.

Pıştî damezırandına Partiya Demokrata Kurdistan a-İran bû serokê partiyê ~~Bx 21'ê Çıleyapaşin 1946'an da~~ Dema ku şertên hundır û dervayi çêbûn dı 21'ê Çıleyapaşin 1946'an da lı bajarê Mahabadê,lı meydana Çuwarçıra'yê Komara Kurd ya Mahabadê ilankır.~~Bx~~ Qadi Mıhemmed ~~bû serokkomarê~~ Jı Komara Mahabadê ra bu serokkomar. Ew dewleta yekemin bû ku Kurdan navê Cumhuriyetê,Cumhuriyeta Kurdan bıkaranibûn.Jiyana Komara Mahabadê nêziki saleki ajot.Lê çı heyf ku hêzên paşverûyên karbıdest êrişên har bırın ser komarê.Pıştî van êrişên har Komara Mahabadê

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

hat hırşandın. Serokkomar Qadi Mıhemmed û rêbırên Komarê hatın gırtın. Qadi Mıhemmed û hevalên vi dı dadgeha leşkeri da ji jı doza xwe, jı gelê xwe neqetiyan. Hêzên karbıdestên paşverû dı tarixa 31 Adar 1947' an da serokkomar Qadi Mıhemmed, serokvezirê komara Mahabadê Heci Baba û vezirê şer Seyfi Qadi lı meydana Çuwarçırayê dardakırın. Lê gelê me, gelê Kurd tu car ew lavên xweyê mêrxas jıbirnekırın. Ew roja bû roja şehidên Kurdistanê.

İro gelê Kurd bı avayê cûre cûre Qadi Mıhemmed û hevalên vi tinê bırawe. İro lı hêramên azadi navê Qadi Mıhemmed bûye navê dıbıstanan, bı navi vi hêzên leşkeri hatıne damezırandın.

Em Qadi Mıhemmed û hevalên vi carek dın ji bı gırami tinên bira xwe, lı ber biranina van bı gırami xwerdıbın. Şehidên Komara Kurd ya Mahabadê tu car nayên jıbirkırın.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI